**Adonîs**

**Damara Sosinê**

**(1-10)**

## 1. Pîremekron

Çiyayê **Pîr** li Suleimaniyê kurkekî ji sîyê û ronahiyê li xwe dike
û destê xwe bo Ferat dihejîne
Lê binêre, di avekê de, ku ji kûzên ewiran dixulxulin
Bi ser de, di ser nerdewanin ji benin sipî re dişimitin
Lê binêre û sertîjkên asoyê bixwêne

Heger tu dost bî, wê berî te bang bike: *Birawo*
Vaye ew li milên zevîneke ku li ber min fireh dibe,
û her cîhek jê dewateke bo govdeyî
Min gotê: Ez ji pîriya xwe hezdikim,
hema niha ez divêm vegerem bibim zarowek

Ez hobibim çewa rast bi berf û ewiran re bilîzim
û min bo xwe got: Ez dipêjinînin, wilo be,
Koneke ku ez hemû karwanên xwe
yên ji helbestê, evîn û dostaniyê bibimê,
û bi xwe re hinek tiştên ku ez bi nav nakim,
da bimînin veşartokên ez wan li gund û bajar belav bikim,
weku wate divê…

Ez di nav karwanekê de ji xew rabûm, ji panpelîskên ku şîrkê zeviyan digepînin,
û peyv hişyar bûn wekî yarên ku pişkovên xwe vekirîne:
Di vê peyvê de newalek xwe vedişêre, di wê de lanê giyanwerên çiyan,
û di hinekan de pînikin bo basikên nenaskirî,
û her çavlêdankek bûbû sarbekek bo ava arezoyê.

Pircaran, min di peymanên xwe de ku min bi bayê re girêdidan şaş kir, û bayê jî ew şaşî ji ser min sivik dikir, û li ser xwe digot: Ez pêdiviyê mişextkirinê û windabûnê me, da ez baş hezbikim.
Ma ji bo vê, pircar, ji ewê ku ez nanasim hezkir?
Ma ji bo vê, pircar, razê xwe hewalda, gava ez şiyarbûna şêtbûnê dibihîsim ku ji xwe re tinaziyê bi balifê mejî dike?
Ma ji bo vê, pircar, perrê pirsê dibe bar li ser şatextê bêgumaniyê?
Lêbelê, li dawiyê, ma tu yê li ber reşavê destan ji ber xwe bernede,
Ey dirindeyê mehder, ey naşêyî?